

Dosya Taybetî

Tehdîta Jenosîdê û Êzîdî -7-

Êzîdî delîla herî mezin ya hebûna me ne. Gelek nîrxên me yê netewî: Zimanê me, dîroka me, adet û toreyên bav û kalên me, bi orîjînalîteya xwe gihandine roja me.

Di qonaxên dîrokî de, gelek qûrban dane. Ev salek e, êrîşên hovane li ser wan zêdetir dibe. Bi şêweyekî hovane, nîrxên me, nîşana hebûna me, gav bi gav ber bi tunebûnê ve dibin...

Em, niqasha pîrsê ji awira ewlekariyê û mafê mirovan ve pir giring dibînin. Di vê dosya taybetî de, em ê dîtînen şexsiyet û dezgehên netewî/ navnetewî li ser pîrsê pêşkêşî we bikin. Cotmeh 2008, Stockholm.

EuroKurd Human Rights

Seroka Federasyona Komeleyên Kurdîstanê Li Swêdê Şermîn Bozarlan: Çanda Ezîdî Çanda Kurdan ya herî kevnare ye

Gabar Çiyan

- Hêja Şermîn, em te ji xebatên Federasyonê yê pîralî û rengîn nas dikin. Em dixwazin dîtina te li ser parastin û ewlekariya Êzîdiyan bistînin...

Şermîn Bozarlan: Kurdên Ezîdî ji ber ku him kurd in û him jî Ezîdî ne; gelek tuda dîtîna e. Bi taybetî ewana di herêmên ku bi fermî ne li ser Kurdîstanê ve hatine girêdan de dijîn, gelek zilm û zordarî dîtîna e û dibînin. Meriv li ku bibe bila bibe, divê meriv ji ber nasnameya xwe ya netewî an jî olîtiyê neyê pelçiqandin û kuştin.

Di herêmen ku grûbên îslamî yê extremist lê hene ewlekariya Ezîdiyan her tim di xeterê de ye. Ewlekariya wan him wek kurd û him jî wek Ezîdî yekcar di bin riskekî mezin de ye. Parastina kurdên Ezîdî, li herêmên ku niha bi fermî ne ser bi Kurdîstanê ne di destê yekem de vatîniya Hukûmeta Iraqê ye.

Hindikbûn zehmet e. Pîranî gelek caran li gor normên xwe rewşa Êzîdiyan nîrxandine. Di xwe de heq dîtîna e ku li ser navê wan xeber bidin û wan tarîf bikin. Meriv divê ji Êzîdiyan bixwe bipirse ew li xwe çawa dinêrin? Çi dijîn? Çi dixwazin? Ji hukûmeta Iraqê çî dixwazin? Ji me kurdan çî dixwazin?

Çanda Ezîdî, çanda kurdan ya herî kevnare ye. Ew li ser axa xwe, çanda xwe ya kurdîtiyê û Ezîdîtiyê bi salan parastine û anîne hetanî dema me. Jiyandina çanda Ezîdîtiyê, jiyandina beşeke bîngehîn ya çanda kurdî bixwe ye. Ez hêvîdar im di demekî kin de herêmên Kurd ku tê de gelek Ezîdî dijîn; bi hêrema Kurdîstanê ve bîna girêdan. Wê demê dê parastina ewlekariya wan hêsantir be!

Destê dijminên kurdan di gelek bûyeran de ku li dijî kurdên Ezîdî hatine kirin, hene. Armanc, provokasyon e. Armanc ew e ku kurd bilîyê hev du bibin, tifaqên xwe xira bikin û destkeftiyên xwe ji dest derbixin.

- Li ser pîrsa Parastina Kurdên Ezîdî li Herêma Kurdîstanê dîtina te çî ye?

Şermîn Bozarlan: Di nav herêma Kurdîstanê de rewşa Kurdên Ezîdî baştir e. Serok, serokwezîr û parlamentoya Kurdîstanê wan bi fermî diparêzin. Têmsîla wan di parlamentoyê de heye. Rêxistinên Êzîdiyan hene. Wek kurdên Ezîdî dikarin doza mafên xwe bikin.

Di jîyana rojane de carna bûyerên nexweş li hemberî êzîdîyan çêdibin. Ji ber ku pêşîya van bûyeran bîn girtin; divê meriv xebatên dûr û dirêj yê sistematîk, xebatên perwerdeyî li ser bingeha civateke pirkulturî, pirolî û pirzimanî û li ser mafê mirovahîyê di dibistan û medyayê de bête kirin. Mamoste, siyasetmedar, karmend, xwendevan, cîran, her kes divê bo parastina Kurdên Ezidî xwe berpirsiyar bibîne.

Di dibistanan de divê ya agahdarî li ser her olî bê dayîn yan jî li ser tu olî tu agahdarî neyê dayin. Divê siyaset û ol cuda bîn girtin. Divê civat yê ku islam wek siyaset bikartînin, yê ku islam li gor menfeat û li gor mêjîyên xwe yê kevneperest şirove dikin, îtîbar neke, ji wan re deng nede. Lewra xwendin û perwerdekirina civatê gelek girîng e.

Di dawîyê de dixwazim bibêjim ku di civata demokratîk ya kurdan de divê qîmeta Kurdên misilman, Kurdên Ezidî, Kurdên bêbawer wekhev be. Zarokên me jî divê li gor vê yekê bîn perwerdekirin.

EuroKurd Human Rights - www.eurokurd.net